

Q X W

KURDISH MONITORING



PLATFORMA ÇAVDÊRÎKIRIN û RAPORKIRINÊ YA MAFÊ ZIMANÊ KURDÎ

Rapora Binpêkirinên Birêkûpêk ên li dijî Ziman û Çanda Kurdî li Tirkîyeyê

2025

KURDISH MONITORING
Mesopotamia Observatory of Justice
QXW

Derbarê Kurdish Monitoringê de

Kurdish Monitoring, ji bo li Tirkîyeyê bînpêkirinê birêkûpêk ên li dijî ziman û çanda Kurdî pêk tên bişopîne, tomar bike û bi raporê wan bi raya giştî re par ve bike ava bûye û înnîyatîfêke serbixwe ya.

Platform li gorî prensîba ku dibêje pirrengiya ziman, mafekî bîngehîn ê mirovan e tevdigere û li gorî vê prensîbê jî dixwaze astengiyên di qada civakî de li pêş Kurdî derdikevin raber bike, daneyan derbarê van bînpêkirinan de amade bike û bi vî rengî mafparêziyê bike.

Kar û Bar û Armancên Platformê

1. Berhevkirina Datayan

- Wê çavkaniyên ji raya giştî re vekirî (dokumanên fermî, biryarên dadgehan, medyaya herêmî û netewî) bişopînin û bûyerên bînpêkirinê tomar bikin.
- Wê hevkarîyê bi saziyên civaka sivil, parêzer û mexdûran re bike û daneyan ji qadê berhev bikin.

2. Rapornivîsîn

- Raporên Birêkûpêk:** Wê her ji şeş mehan û salê carekê raporên berfireh amade bikin.
- Raporên Demkî:** Di rewşên awarte de yan jî dema pêşketinê gelekî girîng pêk hatin, wê bi lez û bez raporên demkî amade bikin.

Rewşa Heyî ya Mafên Bikaranîna Zimanê Kurdî li Tirkîyeyê

Kurdî li Tirkîyeyê rastî astengiyên yasayî û fiilî tê

Mafê Perwerdeyê

Mafê perwerdeyê bi zimanê zikmakî nîne. Bi tenê bi dersên bijarte û bi vekirina saziyên perwerdeyê yê taybet tê sînordarkirin. Hejmareke gelekî kêr hîndekarên Kurdî tayîn dîkin.

Çand û Huner

Şano, konser û berhemên edebî kêfî tên qedexekirin, hunermend dibin hedef.

Medya û Ragihandin

Rojname, kovar û hesabên medyaya civakî yê sazîyên medyayê yê bi Kurdî weşanê dîkin tîn sansurkirin, tîn astengkirin.

Qada Civakî

Tabela yan jî nivîsên hişyariyê yê şaredariyan tîn jêbirin; stran û govenda Kurdî weke "sûc" tîn qebûlkirin.

Dema parlamenter li Parlamentoyê bi Kurdî diaxivin, dengên wan tîn birîn, li şûna gotinên wan ên bi kurdî, gotina "zimanekî nayê zanîn" tê nivîsandin. Li nexweşxaneyan, li cihên kar û yê mîna wan, axavtînen bi Kurdî tîn astengkirin.

Girtîgeh

Nahêlin girtî bi Kurdî xeber bidin, dest datînin li ser name û pirtûkên wan ên bi Kurdî. Yê bi îsrar Kurdî bikar tînin, tîn cezakirin (qedexeya hevdîtinan, qedexeya şandin û wergirtina nameyan û axaftina bi telefonê û yê mîna wan).

2025: Saleke di bin siya bînpêkirinên sistematîk de

Rapora sala 2025an a Kurdish Monitoringê hareke din nîşan dide ku li Tirkiyeyê bînpêkirinên li dijî ziman û çanda Kurdî pêk tîn, ne yek du bûyer in. Ev bînpêkirin li hemû qadên civakê belav bûne û birêkûpêk pêk tîn. Daneyên îsal hatine berhevkirin careke din nîşan didin ku bikaranîna Kurdî ne tenê li kolanan, her weha li girtîgehên ewlehiya wan bilind, li salonên dawetan, li kampusên zanîngehan û li Parlamentoyê jî tê krîmînalîzekirin.

Desteserkirina ciwanên li Colemêrgê li ber strana Kurdî govend digerin, girtina mîkrofona parlamenterên li Parlamentoyê bi Kurdî xeber didan, girtina Mela Silêman Sebrî ya jî ber xutbeya bi Kurdî, qedexekirina formeya Amedsporê ya li ser wê gotineke bi Kurdî hatiye nivîsîn û gelen bûyerên din nîşan didin ku ev bînpêkirin li nemû qadan pêk tîn. Yek jî xalên derketiye pêş ew e ku hîna jî polîtîkaya "zimanê nayê zanîn" û "..." (sê xalan) bi îsrar berdewam dike. Ev sansura ku li Parlamentoyê pêk tê, bi rengekî ku li girtîgehan nameyên bi Kurdî tîn astengkirin û axavtina bi Kurdî ya bi rêya telefonan tê qedexekirin, xwe nîşan dide.


KURTEYA DANeyan

Di serdema rapora sala 2025an de, di qada giştî de 25, di medyayê de 15, di ada çand-hunerê de 18 û li girtîgehan 12 bûyerên bînpêkirinê, bi giştî zêdetirî 70 bûyeran pêk hatine.



Qada Civakî Girtîgeh Çand-Huner Medya

Qada Civakî



KANÛNA PAŞIYÊ

- Parlamentera DEM Partiyê Meral Daniş Beştayê diyar kir ku li dibistaneke navîn a li navçeya Karaçobanê ya Erzeromê, formên ji bo dersên bijarte hatine amadekirin, bi zanyariyên kêrhatî hatine amadekirin û mafê bijartina dersên Kurmancî, Zazakî û zimanên din tîst astengkirin.
- Li Colemêrgê 11 kesên li kolanê li ber stranên Kurdî govend digelandin, hatin desteserkirin.

ADAR

- Li Zanîngeha Teknîkê ya Gebzeyê, komeke jinan a ji 20 kesin pêk hatiye, xwest ji bo 8ê Adarê Roja Jinan meşekê li dar bixe. Rêveberiya dibistanê ji ber sedema ku wê jin "bi Kurdî sloganên berz bikin" û dowîzên bi kurdî hilgirin" jin asten kirin.

- Parlamentera DEM Partiyê Gulderen Varli dema li Civata Giştî ya Parlamentoyê diaxivî, behsa Jîna Emîniyê kir. Dema ku wê, navê Jîna Emîniyê bilêv kir, ji rêvebiriya Parlamentoyê heye ku wê ew bi Kurdî biaxive û dengê Varliyê qut kir. Her weha di zabitnameyên Parlamentoyê de gotina "Jin Jiyan Azadî" nehate nivîsandin.

- Alîgirên tîma Amedsporê ji bo maça Sakaryasporê pankartek amade kir ku li ser wê bi Tirkî û Kurdî nivîsa "Ew ê te tune bihesibînin lê tu yê her wext hebî" hatibû nivîsandin. Ji ber ku Kurdî jî tê de heye, pankart hate qedexekirin. Paşê krîz çareser bû û pankart hate daliqandin.

- Piştî ku Şaredarê Bajarê Mezin ê Stenbolê Ekrem İmamoğlu hate desteserkirin, li Konyayê di dema çalakiyekekê de, xortekî pankarteke bi Kurdî bilind kir. Lî çalakgeran bertek nîşan da û pankart daxistin.

- Afîşa bi Kurdî ya li ser wê "Hûn bi xêr hatin fitara me" hatibû nivîsîn ya Komeleya Tevgera Zimanê Kurdî (HezKurd) li Mala Mamosteyan a Avcilara Stenbolê daliqandibû, hate kêrkin.

NÎSAN

- Walîtiya Antalyayê şahiyên li kolanan dibin, qedexe kir. Piştî vê biryarê, polîsan bi ser şahiyên Kurdan da girtin û nefistin şahî pêk bên.

- Ji ber ku li Esenyûrta Stenbolê bernameyên danasîna dersên Kurdî kiriye, lêpîrsîn li Serokê HezKurdê Parêzer Sûphî Ozgenî vebû.

- Di civîna meha Gulanê ya Meclîsa Şaredariya Bajarê Mezin a Kocaeliyê de, endamê Meclîsê yê DEM Partiyê, xwest ku Cejna Zimanê Kurdî pîroz bike. Lê Şaredar Tahir Buyukakin midaxale lê kir.

- Şaredariya Îdirê, tabelaya Kurdî, li ser deriyê şaredariyê xist. Piştî ku ev nûçe li ser medyaya civakî bela bû, hin kesan bertek nîşan.

- Li Amedê pankarta ku bi kurdî li ser wê "Azadî Îmamoğlu" hatibû nivîsîn, li ser Sûrên Amedê daqilandin. Lê polîsan ew pankart rakir.

- Li Yalovayê li Lîseyaya Anadolûyê ya Teknîk û Pîşeyî ya TOBBê, di dema bernamêyekê de muzîka govendê ya bi Kurdî lê dan, lê wekîlê midûrê dibistanê nehişt muzîka bi kurdî lê bidin û bername bi dawî kir.

- Di dema merasîma derçûnê ya Zanîngeha Dîcleyê de xwendekaran pankarteke bi kurdî bilind kir ku li ser wê "Şagirtên Apê Mûsa Hatîn" nivîsî bûn. Lê bi sedema ewlehiyê, destûr nedan ew pankart bê hildan.

- Endamên Komeleya Hiqûqnasan ên ji bo Azadiyê (OHD) ji bo 15ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî xwestin li Çaglayanê li ber Edliyeya Stenbolê civîneke çapemeniyê li dar bixin. Di dema civînê de parêzeran pankarteke bi Kurdî bilind kir ku li ser wê "Divê zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê" hatibû nivîsîn. Polîsan parêzer dorpêç kirin û xwestin wan asteng bikin.

- Piştî ku li Çerkezkoya Tekîrdagê Komeleya Bipêşxistin û Lêkolînên Çand û Hunerê ya Mezopotamyayîyan vebû, leşker hatin Komeleyê û berett nîşanî tîpên bi Kurdî yên li ser tabelayê dan. Yek ji rêveberên Komeleyê Cevdet Zilanliyî gotiye ku "Piştî Komele vebû bi rowekê, hin leşker ji qereqola navçeyê û hin sivîl ji beşa komeleyan hatin Komeleya me û lêpîrsîna me kirin. Ya herî girîng jî, ji ber tîpên bi Kurdî li ser tabelayê mezin hatine nivîsîn bertek nîşan dan û gotin, hûn Kurdî bi ser Tirkî re dibînin û şîroveyên hiqûqî li ser vê rewşê kirin."

HEZÎRAN

- Li Bajarê Mannheimê yê Almanyanayê, stranbêjekê dema stranên bi Kurdî distira, rastî êrîşê hat. Kêsa êrîşkar got, "Ez Tirk im."

- Xebatkareke Pegasusê beriya balafir ji Stenbolê ber bi Amedê bifire, ji rêwiyên Kurd ên bi Tirkî nizanin gotiye ku "Hûn neçar in bi Tirkî bizanibin." Psîkolog Duygu Berekatoğlu ya ku bûye şahidê bûyerê, li ser hesabê xwe yê Xyê diyar kir ku, ji ber çenteyên wan ji pîvanên diyarkirî zêdetir bû, di navbera wan û xebatkarê de nîqaş çêbû. Xebatkarê ji wan re gotiye, "Ev der Tirkî ye, hûn neçar in zimanê hevpar Tirkî bizanibin."

TÎRMEH

Li Bayrampaşaya Stenbolê malbateke Kurd a ji 10 kesin pêk cihat dema ji seyranê vedigeriyan rastî polîsan hatin û polîsan erebeyên wan dan sekinandin. Ji ber ku malbatê li stranên Kurdî guhdar dikirin, polîsan êrîşî wan kirin, gaza rondikrij rijandin ser çavên wan û ew desteler kirin. Walîtiyê paşê daxuyanî da û got, ji ber guhdarkirina bi dengê bilind a muzîkî polîsan malbat hişyar kiriye û malbatê êrîşî polîsan kiriye.

Li Konaka Îzmîrê Komeleya Avestayê ya dersên zimanê Kurdî dida, ji hêla zabîtayên şaredariyê ve hate girtin.

Qaymeqamiya Kocakoyê ya Amedê ji ber ku di tabelaya şaredariyê de aliyê Kurdî hatiye ronîkirin û aliyê Tirkî di tariyê de maye, nivîs şande Şaredariya Karazê. Şaredariyê diyar kir ku ji ber pirsgirêkeke teknîkî tabelayê kar nekiriye. Şaredariyê got ku qaymeqamiyê ne di saetên kar de nivîs şandiye û ji ber wê jî derfeta wan nebûye lêkolînê bikin.

Mele Silêman Sebrî (Süleyman Sabri Mavi) yê 86 salî yê li Şemzînana Colemêrgê bi nav û deng e ji ber "xwendina xutbeya bi Kurdî û nimêja îne ya sivil" hatibû girtin. Mele Silêman salekê di Girtîgeha Elezîzê de hate girtin. Ji ber nexweşiyên wî û temenê wî yê zêde, di encama raporên doktoran û zexta civakê de Mele Silêman ji girtîgehê dermiştin lê cezayê zindanîkirina li malê dane wî.

ILi Gundê Kisecikê yê Mêrsînê ji ber bi Kurdî axivîne, êrîşî malbateke Kurd a ji 8 kesan pêk dihat kirine. Adnan Nazlı di encama êrîşê de bi giranî birîndar bûye û ew birina nexweşxaneyê.

Dema Dayikên Aştiyê xwestin di Komîsyona "Hevgirtina Milî, Biraî û Demokrasiyê" ya Parlamentoyê de bi Kurdî biaxivin, Serokê Komîsyonê Nûman Kûrtûlmuş bi hinceta ku rêzîknameya Parlamentoyê rê nade wî tiştî, ew asteng kirin. Axavtinên bi Kurdî yê Dayikên Aştiyê Nezahat Teke, Sultan Bozkurt û Rebîa Kiranê, di zabitnameyan de bi rengê "... hatin nivîsandin. Li şûna ku binivîsînin axivêr bi Kurdî axivîne, nivîsandin ku "Di vî beşî de axivêr peyveke ku ne bi Tirkî ye bikar anî."

Şewirmendiya Hiqûqê ya TFFyê, ji ber ku di maça Îstanbûlsporê de formaya li ser wê "Koma me bona we" ya bi Kurdî li xwe kirin, Amedspor şans ber Lijneya Dîsîplînê ya Fitbolê ya Profesyonel (PFDK). Lijneyê 110 hazar TL cezayê pereyan li Amedsporê birî.

Sendîkaya Kedkarên Perwerde û Zanistê (Eğitim Sen) xwestin li Qosera Mêrdînê çalakiyekê ji bo perwerdeya bi zimanê Kurdî li dar bixin. Lê polîsan, bi hinceta ku destûr nehatiye standin, çalakî qedexe kir.

ÇIRIYA PÊŞIYÊ

Li Menemena Îzmîrê, 6 xwendekarên lîseyê ji ber ku di pola xwe de li ber muzîka Kurdî govend gerandine û vîdeoya xwe li ser medyaya civakî parve kiriye, hatin desteserkirin. Xwendekarê ku vîdeo par ve kiriye, bi hinceta ku “propagandaya rêxistinê kiriye” hate desteserkirin.

Amedspor bi formaya xwe ya ku li ser wê bi Kurdî “Koma me bona we” nivîsiye derket maçê. TFFyê careke din 110 hazar TL cezayê pereyan lê birî.

Serokê Komîsyona “Hevgirtina Milî, Biratî û Demokrasiyê” û yê Parlamentoyê Nûman Kûrtûlmuş û endamên Komîsyonê bi hev re çûn Amedê. Beşdarî Bernameya Zanîngeha Dicleyê bûn. Kûrtûlmûşî li vir helbesteke bi kurdî xwend. Vîdeoya wê kêliyê li ser hesabê medyaya civakî yê fermî yê Parlamentoyê hate parvekirin. Hin derdoran ji ber xwendina helbesta bi Kurdî êrîşî vê parvekirinê kir.

Di dema Lijneya Giştî ya Asayî ya 25an a Yekîtiya Odeyên Mihasibên Serbest Şêwirmendên Darayî û Şêwirmendên Darayî yên Sondxwarî (TÜRMOB) de axaftina bi Kurdî hate astengkirin. Huseyîn Bayrakê ku serbixwe kete hîlbijartina rêveberiyê û bi ser ket, xwest bi Kurdî silavê bide. Komeke mihasiyê û şêwirmendan bertek nîşanî axaftina bi Kurdî dan.

ÇIRIYA PAŞIYÊ

Doza Ramazan Şîmşekê xwediyê Pîne Kafeyê ya ku li Amedê ye, berdewam kir. Şîmşekî gotibû ew ê li kafeya xwe tenê bi Kurdî xizmetê bide. Ji be vê jî hatibû desteserkirin û doz lê vebibû. Di danişînê de biryar hate dayîn ku dozê taloqî 2026an bikin.

Di hevdîtinên budceya sala 2026an a Wezareta Karûbarên Hundir de, li Komîsyona Plan û Budceyê ya Parlamentoyê, astengiyeke din li hemberî zimanê Kurdî pêk hat. Peyvên Kurdî yên ku di dema hevdîtinan de hatin bikaranîn, di destpêkê de di zabitnameyên fermî de hatin tomarkirin, lê piştî hatin sansûrkirin.

Piştî pêşkêşiya Wezîrê Karûbarên Hundir Ali Yerlikaya, parlamenterên DEM Partiyê Dilan Kunt Ayan û Mehmet Rüştü Tiryaki mafê axaftinê girtin û di dema axaftina xwe de peyvên Kurdî bikar anîn. Ev îfadeyên Kurdî cara yekem di zabitnameyên fermî yên Parlamentoyê de hatin tomarkirin. Parlamenter Tiryaki îfadeyên "Jinkart" û "Şaredariya Xelfetî" bikar anîn; parlamenter Dilan Kunt Ayan jî dirûşma "Jin, Jiyan, Azadî" berz kir. Lê belê ev dirûşm di protokolê de tenê bi nîşana "... " hate diyarkirin. Peyvên Kurdî yên ku derbasî zabitnameyên fermî bibûn, nêzî 2 saetan piştî qedandina hevdîtinan ji qeydan hatin derxistin. Di şûna peyvên Kurdî de nîşana sê xalan hat danîn û li binê rûpelê ev nota jêrîn wekî hincet hate nîşandan: "Di vê beşê de ji aliyê axivêr ve peyvên ku ne Tirkî ne hatine gotin."


KANÛNA PÊŞIYÊ

Lijneya Tehkîmê ya TFF'ê (Federasyona Futbolê ya Tirkîyeyê), cezayên pereyan ên ku di meha Îlon û Çiriya Pêşiyê de bi hinceta reklama "Koma me bona we" li Amedsporê hatibûn birîn, betal kirin. Lijneyê ceza li dijî hiqûqê dîtin û bi yekdengî biryara betalkirina wan da.

Li Eskişehirê, kurseke zimanê Kurdî ya ku di kafeyekê de dihate dayîn, bi hinceta "perwerdeya bêdestûr" e, hate astengkirin. Di serdegirtina ku ji aliyê Midûriyeta Perwerdehiya Neteweyî ya Navçeyê ve hatî kirin de, hat ragihandin ku kurs bêyî destûra fermî hatiye vekirin.

Li Şirnexê, di serdegirtinên malan ên li taxên Vakîfkent û Bahçelievlerê de ku ji bo binçavkirina Abdullah Temelkuran, Serhat Temelkuran û İrfan Kabul hatin kirin, bînpêkirineke giran a mafan pêk hat. Hat îdiakirin ku Hanife Kabul, dayika İrfan Kabul a ku bi Tirkî nizane, ji bo bi Tirkî biaxeve neçar kirine. Li gorî zanyariyan, dema keça wê ji polîsan re gotiye ku dayika wê bi Tirkî nizane, polîsan bi gotina "Axaftina bi Kurdî qedexe ye" bersiv dane û mudaxele kirine.

Medya



Bînpêkirinên di qada medyayê de piranî wekî astengkirina ketina malperan, girtina hesabên medyaya civakî û sansura weşanên zindî yên bi bi Kurdî pêk hatin.

KANÛNA PAŞIYÊ

- Hesabê Ajansa Mezopotamyayê yê Xê (Twitter), yê JINNEWS û Yeni Yaşamê hatin astengkirin. MAYê hesabekî nû vekir, lê ew jî hate astengkirin.

SIBAT

- Dadweriya 2yem a Aştî û Cezayî ya Semsûrê bi hinceta "parastina ewlehiya netewî û pergala civakî" malpera Ajansa Mezopotamyayê asteng kir.

- Hesabên MA û Jinnewsê yê Xê hatin astengkirin.

- Dadweriya 6em a Aştî û Cezayî ya Enqereyê hesabê YouTube, X û Instagramê yê rojnameger Abdurrahman Gokî asteng kirin.

- Hesabê Jinnews'in yê Xyê yê Kurdî (@jinnewskurd) hate astengkirin.

- Hesabê Jinnewsê û Xwebûnê yê Xê hatin astengkirin.

- Pêşkeşkara Sözcü TVyê Serap Belovacıklı, Kurdiya nameya Rêberê PKKyê Abdûllah Ocalan a 27ê Sibatê de hate xwendin ne weşand. Dema Ahmet Türk name bi Kurdî xwend, Belovacıklı got, "Dema bi Tirkî, zimanê fermî yê di nava sînorê Komara Tirkîyeyê de tê bikaranîn bixwînin, em ê bînin ser ekranê." Belovacıklıyê sansura li ser Kurdî bi van gotinan parast: "Ji ber kes bi Kurdî fam nake, em nadin." Habertürk TV û NTVyê jî Kurdiya heman daxuyaniyê neweşandin.

HEZÎRAN

- Bikarhênerekî/e Ekşî Sözlükê, xwest ku di Ekşî Sözlükê de bi Kurdî jî bê nivîsandin. Bikarhênerên din bi rengekî nîjadperest êrîşî wî/wê kesî/ê kirin.

TÎRMEH

Instagramê hesabê Ajansa Welatê asteng kir.

TEBAX

Instagramê careke din hesabên Ajansa Welat û Xwebûnê asteng kirin.


KANÛNA PÊŞIYÊ

Hin kesên ne diyar li Îzmîrê êrîşî tabelaya Weşanxaneyê Pêriyê kirin û bi spreya ew reş kirin.

Çand - Huner

PIRTÛK Û STRAN

Di sala 2025an de qedexeyên konseran, desteserkirina pirtûkan û dozên li dijî hunermendên Kurd wekî polîtîkayeke sereke berdewam kir.



KANÛNA PÊŞIYÊ

- Polîsan li Amedê bi ser avahiya Komeleya Wêjekarên Kurd de girt û dest danîn li ser 150 pirtûk û hazar û 500 nisxeyên rojnameyan.

- Ji ber ku di dersên xwe de helbestên bi Kurdî dane xwendin, rêveberiya Zanîngeha Mûş Alparslanê lêpîrsîn li akademîsyenekî beşa Ziman û Wêjeya Kurdî vekir. Pirtûkên ku bûne sedema lêpîrsîn li akademîsyenê vebe, bi destûra Wezareta Çandê hatine çapkirin ku ya Fatma Savciyê ku Weşanên Avestayê çap kiriye, ya Arjen Arî ku Weşanên Sorê çap kiriye û ya Cegerxwîn ku Weşanên Lîsê çap kiriye.

- Ji ber sê stranên bi Kurdî li Qers û Çanakkaleyê strane, 30 meh cezayê girtîgehê li hunermend Kasim Taşdoğan birîn.

- Derhêner Kazim Oz, ji ber fîlmê xwe yê bi navê "Zer" hate desteserkirin.

SIBAT

- Hunermend Seyda Perînçek dema xwest ji bo konserekê biçe Japonyayê, li sînor hate desteserkirin û dersînorkirin. Li gorî îdiayan Konsolxaneyê Tirkîyeyê daxwaza betalkirina konserê li rayedarên Japonyayê kiriye.

- Polîsan li navçeya Konakê ya Îzmîrê bi ser saziya Jîn Art Sanatê de girt. Kamerayên ewlekariyê metal kirin, dest danîn li ser pirtûk û komputeran, ala Tirkan li ser texte xêz kirin.

- Piştî ku 22 meh û 15 roj cezayê girtîgehê li stranbêj Mazlûm Akpolat hatibû birîn, hate erêkirin, Akpolat hate girtin. Ji ber straneke Kurdî ev ceza li Akpolat hatibû birîn.

ADAR

- Ji ber pirtûka "Hîker"ê ya perwerteya Kurdî, nivîskar Mevlût Aykoç, Sami Tan, Ronahî Önen û Sadık Varlı hatin desteserkirin. Her weha, ji ber ku fotografên wan di pirtûkê de hene, İzzet Çınar û Şükriye Çınar jî desteler kirin. Aykoç, Tan, Öner û İzzet Çınar tevî Şükriye Çınarê bi şertê kontrola edlî serbest bûn. Varlı bêyî kontrola edlî serbest bû.

GULAN

- Dozgeriyekî bi hinceta ku "bi ser rêxistinê ve ye" pirtûka "Lawikê Gundî" ya Şerîf Yilmazî berhev kir.

- Li Wanê koma Şanoyê ya Nupelda Tiyatroyê xwest ku lîstika xwe ya bi navê "Ma Diz Yek E!" li ser sehneya Şanoya Dewletê ya Wanê bilîze. Digel hemû serlêdanan, daxwaza wan nehate pejirandin.

- Li Bedlîsê, 5 nivîskarêbn Kurd ên ku xwestin beşdarî Pêşangeha Pirtûkan bibin, bi biryara Walîtiyê ve hatin astengkirin.

- Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, helbestên helbestvanên klasîk ên Kurd, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Hacı Qadirê Koyî, Melayê Xasî û Siyapûş jî di nav de yên 40 helbestvanî li Kolana Gaziye ya navçeya Sûrê li ser peyareyan dane nivîsandin. Lê piştî çend rojan hin kesên nediyar êrîşî wan keviran kirin ku helbest li ser wan nivîsandibûn. Şaredariyê helbest ji wir Irakirin û ew li dîrekan daliqandin.

KANÛNA PÊŞIYÊ


- Koma Amedê xwest ku li Kuçukçekmeceya Stenbolê konserekê bide. Lê Qaymeqamiya Kuçukçekmeceyê, roja ku konser wê pêk cihata, "guncav nedît" û konser asteng kir.
- Dadgeha Aştî û Cezayan a 4an a Enqereyê biryar da ku albûma muzîkê ya Awazê Çiya ya bi navê "Dara Jiyanê" li ser Spotifyyê bê qedexekirin. Dadgehê biryar spartiyê xala 8/A a Qanûna Înternetê ya hejmar 5651ê. D iencamê de albûma navborî li Tirkîyeyê hate astengkirin.

Girtîgeh

Binpêkirinên Giran

Cûreyên Binpêkirinan

- Qedexeya Pêwendiyê (Telefon/Name)
- Qedexeya Pirtûk û Weşanan
- Cezayên Dîsîplînê / Şewitandina Înfazê
- Astengkirina Parastina bi Zimanê Kurdî



KANÛNA PÊŞIYÊ

- Salim Gûranê ji ber dosyaya kuştina keça bi navê Narin Gûranê hatibû girtin, dema li Girtîgeha Hejmar 1ê ya Ewlehiya Bilind a Erzeromê bi rêya telefonê bi malbata xwe re bi Kurdî axiviye, hatiye astengkirin.

- Endamê Grup Yorumê Rezzan Şengul, li nexweşxaneyê xwest ku bi girtiyên din re bi Kurdî biaxeve. Leşkeran êrîşî Şengul kir. Pirtûkên bi Kurdî nedane girtiyên li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Kirşehîrê.
- Pirtûkên bi Kurdî nedane girtiyên li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Kirşehîrê.

SIBAT

- Li Girtîgeha Jinan a Erzînganê nameyên bi Kurdî 4-5 mehan didin sekinandin û paşê didin girtiyan.

- Li Girtîgeha Hejmar 1ê ya Ewlehiya Bilind a Elezîzê, pirtûkên bi Kurdî û nameyan nadin girtiyan.

NÎSAN

- Cengaver Aykulê li Girtîgeha Elezîzê tê girtin ji ber ku ferhenga Kurdî li ba wî hebû bi cezayê disîplînî hatibû cezakirin. Aykul serî li Dadgeha Destûra Bingehîn dabû. Dadgehê biryar da ku mafê azadîna xweîfadekirinê ya Aykul hatiye bînpêkirin.

- Li Girtîgeha Boluyê, Îhsan Balkaş xwest ku nameyên xwe bi Kurdî bişîne. Lê rêveberiya girtîgehê bi hinceta ku "nehatiye fahmkirin" name neşandin û daxwaza heqê wergeriyê kir.

- Tehliyeya 33 girtiyên li Girtîgeha Boluyê bi hinceta ku pirtûk û weşanên bi Kurdî xwendine hate astengkirin.

HEZÎRAN

- Li Girtîgeha Boluyê rêveberiya girtîgehê nameyên girtiyan ên bi Kurdî neşandine û nehiştine ew weşanên bi Kurdî bixwînin.

- Li 17 girtîgehên herêma Marmarayê weşanên bi Kurdî û yên mixalîf bi regekî sistematîk tên astengkirin.

- Li Girtîgeha Ezzeromê, ji ber ku li ser wî "Hebûn" nivîsiye, formeya Amedsporê nedane girtiyan.

TÎRMEH

*Li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Erzînganê Agît Kortakê li lînûska wî stranên Kurdî hebûn, bi 11 roj cezayê hicreyê hate cezakirin.

*Li Girtîgeha Erzeromê, rêveberiya girtîgehê careke din formeya Amedsporê ya bi Kurdî li ser "Hebûn" nivîsandibû, nêdan girtiyan û bi şûn de şand.

TEBAX

*Li Girtîgeha Tîpa Tyê ya Şirnexê, girtiyan diyar kir ku ji bilî pirtûka Mem û Zînê ya Wezareta Çandê çap kirî, nahêlin pirtûkên din ên Kurdî bistînin.

ÇIRIYA PÊŞIYÊ

*Li Girtîgeha Jinan a Erzînganê, girtiyên ku bi rêya telefonan bi malbatên xwe re diaxivin, hatine astengkirin û axavtina bi Tirkî li wan hatine ferzkirin.

ÇIRIYA PAŞIYÊ

*Li gorî rapora OHDyê, li girtîgehên herêma Antalyayê, bi hinceta "werger"ê, nameyên bi Kurdî tên wendakirin.

*Li girtîgeha Erzînganê, destûrê nadin ku girtî bi rêya telefonan bi Kurdî bi malbatên xwe re biaxivin.

KANÛNA PÊŞIYÊ

*Umît Tamûr, Cesîm Yıldırım, Îbrahîm Ertaş û Ozkan Bayhanê ku li Girtîgeha Tîpa Syê ya Manavgata Antalyayê girtî ne, dema li Dadgeha Cezayan a Asliyeyê ya 2yem a Manavgatê derketine pêşberî dadwer, xwestine bi Kurdî xwe biparêzin. Dadwerî gotiye "Ma hûn henekên xwe bi min dikin? Ev der dadgeha Komara Tirkîyeyê ye, li dadgeha min, hûnê bi Tirkî biaxivin. Ez nahêlim hûn bi Kurdî biaxivin. Hûn kî ne?" û axavtina bi Kurdî asteng kiriye.

*Girtiyê bi navê Dilaver Karasû yê ku li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Hejmara 1ê ya Erzeromê girtî ye, ji bo beşdarî danîşîna doza xwe ya Xelatê bibe, birine Girtîgeha Tîpa Tyê ya Xelata Bedlîsê. Karasû xwestiye ji vir fakseke bi Kurdî bişîne. Lê destûr nedane wî.

KURDISH MONITORING

Rapora Binpêkirinên Sîstematîk ên li Dijî Ziman û Çanda Kurdî li Tirkîyeyê - 2025

